Hikûmetek nû ji bo tevayê Swêdê

Platforma "hikûmeta keskûsor (Socialdemokraterna, Vänsterpartiet, Miljöpartiet)" programa xwe ya xebatê pêşkêşî raya gîştî dike;

Em mesûliyeta pêşerojê hildigirin ser xwe. Swêd, mîna demên berê dê giraniyê bide xebata qezenca dezgehên fermî. Ji bo "îqtîdara nû ya keskûsor", wekhevî bendek esasî ye.

Ji ber polîtîka îqtîdara niha ya kêmkirina bacê, hejmarek bilind ji ciwanan bê kar û şixûl man. 25 hezar kesên di dibistan, dezgehên lênerîna nexweş û pîrûkalan de dixebitîn, karên xwe winda kirin. Nexweşên giran ji mafên xwe û sîgortebûnê bêpar man û xwezaya kar têk çû. Heman hikumeta burjûwa careke din dixwaze, di reya xwe ya nestabîl de, 4 salên din jî siyaseta xwe bidomîne. Encamek wisa dê Swêdê bimehîne, îmkan û mecalên ji bo kar û pêşketinê hene têk bibe û gav bi gav ji holê rake.

Pêwîstiya Swêdê bi hindavnîşanderekî nû heye. Em ê ji bo kurkirina ferqiya di nav sinifan de kar nekin. Iqtîdara "keskûsor" dê ji bo peydekirina karên nû derkeve rê. Deng û rayên me dê ne ji bo kêmkirina bacê û zêdekirina para dewlemendan be. Em ê ji bo xurtkirina dibistanan û bilind kirina kalîteya lênerînê ji bo nexweş û pîrûkalan bixebitin. Em, di şûna tiraletî û tembeliyê, çalakbûna di kar de û xurtkirina xwezaya kar dixwazin.

Tu, Swêdekî çawa dixwazî û hildibêjêrî?

Peydekirina karê nû û pêkanîna aboriyek xurt anjî buhayê wê çi dibe bila bibe kêmkirina bacê?

Armanc û daxwaziyên "hikumeta keskûsor" ku nû ava bibe, ev in:

- Vegera Swêdê li rojên demên berê û zêdekirina qezenca dezgehên fermî yên xwedî sermiyan

- Peydekirina 100 hezar karê nû, praktîk û perwerdê

- Rakirina "baca kardêran" ku ciwanên bê kar, di karxaneyan de bi cî dikin

- Başkirina mecalan ji bo fîrmayên biçûk û kêmkirina "mesrefên civakî". Kêmkirina "baca bikaranînê" ji bo restoranta û mecala peydekirina sermayeya bi rîsk

- Pêkanîn û organîzekirina "kaseya bêkariyê" bi şiklekî rêkûpêk, da ku her kes karîbe bibe endam û endamên wê ji hatina xwe ya aborî piştrast û bi ewle bin û

mehaneyên wan têra wan bike. Xurtkirina mafê her kesekî ji bo peydekirina karê berdewam, bi ewle û sabit

Refahek bilind di mustewa cîhanê de anjî tevî ku bi xisar be kêmkirina bacê?

Armanc û daxwaziyên hikumeta keskûsor ku nû ava bibe, ev in:

- Veqetandina 12 milyarên zêde ji bo dibistan û dezgehên lênerîna nexweş, pîrûkal û zarokan

- Kêmkirina heqê pêşdibistanê, ji bo zaroka pêşî 360 kron û ya duwê 240 kron, anku ji malbatên xwedî du (2) zarok re, erzankirina heqê dibistanê bi qasî 600 kronan

- Bicîhkirina 6 000 mamosteyên nû di dibistanên destpêkê de

- Di pêşdibistanan de mecalên bilind kirina jîrbûnê. Planek nû ji bo her pênc (5) zarokan bicîhkirina mamosteyekî

- Divê "baca teqawîdbûnê" nema bê dayîn û ji holê bê rakirin. Meaşê teqawîd bûnê mehaneyên dereng mayî ne. Divê bac tenê ji kesên kar dikin bê qûtkirin û pîvana bacê ji bo hemu kesan yek be

- Pêwîst e lênerîn ne li gorî îltîmasê, li gorî hewcedariyê pêk were. Divê hejmara timobîlên doktorên mala, nexweşxaneyên acîl zêde bibe û nexweşxaneyên herêmî êvaran jî xizmetê bidin. Her wisa tedawiya diranan hetanî 25 salî bêpere bê kirin

- Benda sîgorteyê ku nexweşên giran mecbûrî kar dike û tazmînatên wan dibire (stupstocken) divê bê rakirin. Kesên bê sîgorte hatine hiştin, ji nû ve bêne sîgortekirin. Tazmînata nexweşan bibe xwedî standart û normên makûl. Divê neyê jibîrkirin ku, kesên bê mecal û hejar bê hiştin, siheta wî jî baş nabe.

Zîrekbûna Swêdê ji awira îklîm û avûhewayê anjî tevî ku bi xisar be kêmkirina bacê?

Armanc û daxwaziyên hikumeta keskesor ku nû ava bibe, ev in:

- Veqetandina 100 milyaran ji bo "avahiyên bingehîn (ragihandin, enerjî ûhwd)", trafîka kolektîv, trênên bi lezgînî

- Parastina jêbirîna ROT ê (ROT avdrag) hetanî peryodekî din, paşê guhertina wê bi "bonusa îklîmê"

- Mafê "jêbirîna îklîmê" bidine malbatên ku xaniyên xwe bi nû dikin, sîstema elektrikê didin guhertin û bi rêya nûkirinê ji % 30 mesrefa enerjiya xwe kêm dikin

- Veqetandina peran ji bo programekî îklîmê ya nû ku berê wê li teşwîkirina xebatên herêmî ya îklîmê be

- Piştgiriya kesên xwedî timobîl ku di şûna benzînê de, enerjiya ji bo hawîrdor kêmxeter bikar bihênin